NÜRNBERG

Lêzanînên girîng derbarê vaksînekirina nexweşiya Koronayê



Çima vaksînekirina nexweşiya Koronayê jibo min baş e?

- Vaksînekirina Koronayê bi başî te diparêze. Vaksînekirin, te li hemberî nexweşiya giran a Koronayê û mirinê diparêze.
- Her wiha vaksînekirin malbata te li hemberî veguhestina vê nexweşiyê diparêze.
- Qanûnên Koronayê, jibo kesên ku vaksînekirin pêk anîne **kêmtir** diwar in. Lê jibo kesên ku vaksîne nebûne, wiha **nînе**.
- Vaksînekirina Koronayê xwebexş û dilxwazî ye. Lê: Te diparêze!

Asta zêde ya tûşbûna bi Koronayê di mirovan da çiqas e?

- Hin kes bi dijwarî tûşî vê nexweşiyê dibin an di demdirêj da tûşî pirsgirêkên tendurustiyê dibin.
- Hin kes divê herin nexweşxaneyê, hinek bo beşa lêmiqatebûnên taybet jî tên veguhestin.
- Gelek kes jî ji ber tûşbûna bi Koronayê, mirine.
- Vîrûsa Koronayê bi taybet jibo van kesan xeternak e: Jibo kesên temendirêj an kesên ku nexweşiyeka taybet bi wan ra heye. Lê kesên ciwantir û saxlem jî renge bi dijwarî tûşî vê nexweşiyê bibin.



Vaksîn çiqas bibandor in?

- Vaksînên cûrbecûr hene. Tevahiya van vaksînan ji aliyê ajansa dermanî ya Ewropayê va hatine vekolandin.
- Ev **nabin** sebeba nezabûn û jidestçûna şiyana te ya zayendî û di wan da traşe anku Chip **nayê** bikarabnîn. Li înternetê gelek **Raporên Nedurust** hene.
- Wekî hemî dermanan, hin caran dûhatên pêreyî jî hene, lê ev yek kêmdîtî ye. Gelek kes, vaksînan bi başî werdigirin.
- Renge jibo heyameke kurt hesta nexweşiyê bikin. Tevî vê yekê, xeterên nexweşiya Koronayê gelekî zêde ne!



Mesrefa vaksînekirinê çiqas e?

Vaksînekirin **bêpere** ye.



Min hewcetî bi çend vaksînekirinan heye?

Derbarê pirraniya vaksînan, te yê hewcetî bi du qonaxên vaksînekirinê bi navbira çend hefteyan hebe. Jibo lêdana derziya her du qonaxên vaksînekirinê, dê dem bo te were terxankirin. Bi vî awayî tu li hemberî nexweşiya giran a Koronayê dê werî parastin.

NÜRNBERG





impfzentren.bayern.de

CORONA IMPFZENTRUM





www.nuernberg.de



integreat.app/nuernberg/de

Ez çawa dikarim derziya vaksînê lêdim?

- Jibo pêkanîna vaksînekirinê te hewcetî bi **diyarkirina demê** heye. Jibo vê yekê, tu divê **navê xwe tomar bikî**.
- Piştî demekê, tu yê peyamekê werbigirî.
  Di vê peyamê da roja vaksînekirinê hatiye diyarkirin.

Ez çawa dikarim navê xwe tomar bikim?

- Tu dikarî li cem bijîşkê malbata xwe navê xwe tomar bikî.
  Bijîşkên malbatê jî vaksînê lêdidin.
- Tu dikarî li **Înternetê** navê xwe tomar bikî:
  www.impfzentren.bayern.de
- An jî digel vê **hejmara telefonê** bikevî têkiliyê: 0911 / 148 98 243

Li Nürnberg‘ê, ez li ku dikarim derziya vaksînê werbigirim?

- Li cem **bijîşkê malbata xwe**
- Li **Navenda vaksînekirinê** li Messezentrum
  (Rawestgeha metroyê ya „Messe“ li xetê metroyê U1)
- Li **Citypoint** li navenda bajêr
  (Rawestgeha Metroyê ya„Lorenzkirche“ li xetê metroyê U1)
  navnîşan ev e: Pfannenschmiedsgasse 20, Nürnberg
- Li früheren **KfZ-Zulassung**.
  Navnîşan ev e: Großreutherstr. 115 B, Nürnberg

Bi vaksînekirinê dê çi biqewime?

- Beriya vaksînekirinê, dê bijîşkek bi te ra biaxive û her tiştî bi hûrgilî şirove bike. Tu dikarî her pirsekê bipirsî.
- Piştra vaksîne bi riya surengê dê li baska te were derzîkirin.
- Piştî pêkanîna vaksînekirinê, tu yê bi qasî 15 deqîqeyan bêhna xwe vedî.

Gelo pirsine te yên pirtir hene?

Di vî warî da, hin fîlm ji kilînîka Nürnberg‘ê hene. Bijîşk bersiva 10 pirsên girîng derbarê vaksînekirinê didin. Tu dikarî jêrnivîsa fîlman bi van zimanan eyar bikî: Tirkî, Rûmanyayî, Rûsî.
Tu dikarî fîlman li vir peyda bikî:
www.klinikum-nuernberg.de/impfvideos

Tu dikarî lêzanînên zêdetir bi riya Înternetê bi dest bixî, li:
www.nuernberg.de

Sererastker: Bajarê Nürnberg‘ê, Ofîsa Hevahengiya Navenda Vaksînekirinê, Hans-Sachs-Platz 2, 90403 Nürnberg Redaksiyon: Ofîsa Hevahengiya Navenda Vaksînekirinê